



Em bi hev re dijî pandemîkê bi ser dikevin

Di şerê dijî koronavayrusê de, her dozeke derzîlêdanê arîkariyeke girîng dike. Lêdana derziyê we hemberî tûşûna giran a kovîd-19ê diparêze. Û ew vê metirsiyê kêmtir dike ku hûn vayrusê veneguhezînin kesên din. Her çiqasî kesên pirtir li Swîsê werin derzîkirin, ewqasî zûtir pandemî dê zûtirkê kuta bibe.

foph-coronavirus.ch/vaccination

Xeta zanyariyan bo Derzîlêdana Kovîd-19ê: **0800 88 66 44**



Schweizerische Eidgenossenschaft
Confédération suisse
Confederazione Svizzera
Confederaziun svizra

Swiss Confederation

Çima lêdana derziyê pêwîst e?

Koronavayrus gelekî jêgir e. Hin nexweşên vê nexweşiyê tûşî rewşeke giran a vê nexweşiyê dibin. Ji 90% pirtir nexweşiyên yekeya muqateya taybet ew kesin ku derzî li xwe nexistine. Tûşbûn dikare bibe sebeba dîhatên dem-dirêj jî: Nîşaneyên Kovîda Dirêj kêmbûna nefesêkişandinê, westîbûn û şiyânên kêmbûyî. Ev dikare ser kesên nûciwan û mezin bandorê dayîne.

Sûda lêdana derziyê çi ye?

Hemû derziyên bi destûr li Swîsê gelekî zêde kêrhatî ne û we dijî nexweşiya giran a kovîd-19ê diparêzin. Derzîlêdan metirsiya veguhestina vayrusê li kesên din jî kêr dibe – loma hûn dikarin xwe û bi taybet kesên zianbar li malbat, mal, koma hevalan yan cihê karê xwe biparêzin. Her çiqasî hejmara kesên derzî li xwe xistibin pirtir be, ewqasî vayrus kêmtir li civakê belav dibe û kesên kêmtir nexweş dikevin yan ji koronavayrusê dimirin.

Sûdên lêdana derziyê bi kurtasî:

- Metirsiya tûşbûna bi koronavayrusê kêr dibe.
- Pêşiya pêketina giran a Kovîd-19ê û dûhatên demdirêj digire.
- Meirsiya veguhestina vayrusê kêr dibe.
- Barê pergala muqateya tenduristiyê kêr dibe.
- Ew dibe alîkar ku di jiyana rojane de bêtir azadî hebe.

Derzîlêdan çawan bandorê datîne?

Derziya Kovîd-19ê rê dide bedenê bergiriyê ewlebûnê ku bi awayê taybet vayrusê armanc dibe çêbibe. Ev vayrus çiqasî zûtirkê têkeve nava bedenê, dikare dijî nexweşiyê şer bike û pêşiya wê bigire. Loma lêdana derziyê pergala ewlebûna me bi taybet dijî koronavayrusê xurt û perwerde dibe.

Kîjan vaksînan hene?

Du vaksînên mRNA û yek vaksîna vektorê niha li Swîsreyê peyda dibin. Li vir, hûn dikarin fêr bibin ka bandora wan çawa ye:



Vîdyo li ser vaksînên mRNA
vimeo.com/492783396



Vîdyoya der barê vaksîna vektorê
vimeo.com/509686017

Gelo lêdana derziyê ewle ye?

Pêwîst e her derzî li Swîsê bi destûr be. Bo vê yekê, divê xwedana pîvanên bilind ên ewlebûn, kêrhatîbûn û başbûnê be. Dezgeha Swîsê bo Berhemên Dermanî, Swissmedic, derziyên Kovîd-19ê bi temamî test û erê kiriye. Ew ewle û kêrhatî ne.

Lêdana derziyê bi derziya mRNA li kê tewsiye dibe?

- Hemû kesên ji 12 salî
- Jinên giran (bo parastina dayîkê û zaroka nehatiye dinyayê) û jinên şîr didin zarokan
- Nexweşên ku pag bûne (tenê dozeke derziyê pêwîst e, ji ber ku carekê tûşbûn wekî dozek derzî kar dike)

Ji bo xortên 12 û 17 salî, jinên ducanî û şîranî, û kesên ku sîstema xweparastina laşê wan têkçûye, tenê vaksînên mRNA têne pêşniyarkirin.

Li ku dikarim derziyê li xwe bidim?

Hûn dikarin li navendên derzîlêdanê, nexweşxane yan dermanxaneyan, bi bijîşkê malbatê û bi rêya xizmetên gerok derziyê li xwe bidin. Hûn niha dikarin zanyariyên ser rojên lêdana derziyê li kantona cihê jiyana xwe bizanin: **foph-coronavirus.ch/cantons**

Li ku dikarim zanyariyên pirtir peyda bikim?

Hûn dikarin hemû zanyarî, navnîşan û belgeyan ser vir peyda bikin **foph-coronavirus.ch/vaccination**.

Ev tê de hene:

- Vîdyoyên zanyarî û şîrovevî ser derzîlêdanê
- Rastiyên ser derzîlêdanê
- Zanyariyên ser bawernameyên Kovîdê
- Nivîsên zanyariyan bo daxistinê
- Zanyariyên ser seferê

Xeta zanyariyan bo derzîlêdana Kovîd-19ê:
0800 88 66 44

Zanyariyên bi zimanên din:
foph-coronavirus.ch/languages

